

AGAHI-RAZIBUN JI BO BIKARANINA DANAYEN SEXSI LI GORI RIZNAMEYA (YEKITIYA EWROPAYE) 2016/679 U TEKILDARIYA ZAGONEN YUNANI

A. Agahdarî

Komeleya "Allieggie SolidarityNow" (piştgirî) (ji vir û pêda "SolidarityNow" an ji "Kemel") ku navenda wê li Atîna ye, li ser rêya 3 Septembrî 24 (telefona têkiliyê 2106772500) wek sûdmendên Komelê (ji vir û pêda Sûdmend) we agahdardike ku, bi taybetmendiya xwe wek berpirsiyarê bikaranîna daneyên şexsî û li gorî Rêznameya Giştî a (Yekitiya Ewropayê) 2016/679 bo Parastina Daneyan û li gorî zagonên yûnanî bo parastina daneyên şexsî, ku li gorî van rêbazên li jêr hatine diyarkirin wê danayên we ê şexsî bikarbîne.

1) Em kîjan danayên şexsî bikartînin?

"SolidarityNow" ji bo sûdmendên xwe van danayên ku li jêr hatine nivisandin bikartîne:

- a) Agahiyên nasandinê: nav, paşnav, belge-weraqa nasandinê, roja ji dayikbûnê, hêjmara sîgorteya tenduristiyê, îmze,
- b) Agahiyên têkildariyê: navnîşana posteyê, telefon, navnîşana elektronîk,
- c) Hemwelatî,
- d) Zayend,
- e) Wêneyên rû-wec, eger têxwastin

Ji bilî van agahiyên li jor, di berdewamiyê da agahiyên din ji bo tevlêbûna we pêwistin, wek Sûdmend ku hun tevlî bernameya piştgiriya/bernameyên piştgiriya ku we li jêr hilibjartinin. Bi taybetî:

- Ji bo xizmetên kar-şixul: agahiyên meslekî-pîşeyî (serpêhatiyên we ê kar-şixulê berê, wesfên meslekî-pîşeyî, belga CV-kurtejiyan),
- Ji bo xizmetên perwerdahiyê: agahiyên bo serpêhatiyên ê kar-şixulê we ê berê, perwerdahiya berê û adanîya perwerdahiya vê gavê.
- Ji bo piştgiriya derûnî û xizmetên tenduristiyên ê din: çîroka tîbbî a tenduristiya derûnî û fîzikî
- Xizmetên xanî-mal: rewşa malbatê, agahiyên dahatê û rewşa serwet-hebûnê, danayên tenduristiyê, agahiyên têkildarî daw û dozên hiqûqî ku bi dawî nebûne (statûya hiqûqî ji dinavda û sûcên sizayî û sizayên mahkûmiyetî), hêjmara reqemê peyirk-sicîla bacê, hêjmara destûra rûniştandinê (li ku hebe), hêjmara qerta daxwaza mafê penaberiyê, hêjmara dosyaya mafê penaberiyê, agahiyên hesabê bankayê (eger hebe), agahiyên bo gihîştina mafê piştgiriya civakî, dîn-ol, meslekî-pîşeyî û asta perwerdahiyê, agahiyên ji bo dayîna alîkariya aborî ji aliyên saziyên din.

- Ji bo xizmetên hiqûqî: agahiyên ji bo daw-dozên hiqûqî (statûya huqûqî ji di navda û sûcên sizayî û sizayên hatine mahkûmkirin),
- Piştgiriya muhasabeyî: agahiyên dahat-qezenca salê û rewşa malhebûn-serwetê (beyana forma bacê), AFM(hêjmara bacê), koda bikarîner û têketina sepana elektronîk bo ragihandina dahata-qezenca bacê (mînak: taxisnet)

2) Em ji bo çi van danayên we ê şexsî ên li jor bikartînin?

- Ji bo nixandina pêdiviyên-hewceyîyên we û dayîna alîkariya xizmetên piştgiriye ê guncav.
- Ji ber pêwistiya Komelê li gorî hiqûqê tevbigere û daxwaza finansmanên xwe bicîbîne.
- Ji bo armancên parastin û lêkolînê ku Komel pêk tîne û dîsa dayîna agahiyên anonîm bo lêkolîn û raporên ku kesên sisêyan pêktînin (mînak: Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî bo Penaberan UNHCR û saziyên sivil û hwd).

3) Kî xwe dikare bigihîjine danayên we ê şexsî?

- Karmendên Komelê ku ji bo dayîna xizmetên piştgiriye berpirsiyarin (karmendên pêşwaziyê, şewirmendên civakî, derûnnas, muhasebecî û hwd).
- Û dîsa di rewşên li jêr da danayên we dikarin werin dayîn bo kesên sisêyan:
 - Saziyên navdewletî ku peran bo bernameyên piştgiriye ê Komelê didin. (mînak: Qomîseriya Bilind a Netewên Yekgirtî bo Penaberan UNHCR), wek ku saziyên navdewletî ji bo dayîna peran şert û mercan datînin.
 - Bo Saziyên sivil ê din an jî kesên sisêyan ku tevî bernameyên piştgiriye dibin (mînak: wek saziyên perwerdahiyê, wek kesên sisêyan ku xizmetên bo xaniyan dikin, doktor-bijîjk û nexweşxane).
 - Dema ku were daxwazkirin bo rayedarên dewletê. To “SolidarityNow” daneyên Sûdmenda bişûnda nade rayedarên welatê ku jêhatine an jî rayedarên desthilatdarên dewletên din.

4) Ji bo çiqas dem-wext em daneyên we ê şexsî ku me komkirine em li cem xwe hildigrin û bikartînin?

“SolidarityNow” danayên şexsî ên Sûdmendan heta ku bernameya piştgiriye berdewam dike li cem xwe hildigre û 5 sala piştî bernameya piştgiriye jêdibe, lê eger: (i) finansmanê bernameyê cûdatir dixwaze, an jî (ii) li gorî qanûnê wisa tê xwastin, an jî (iii) daneyên şexsî ji bo bikaranîn an jî bo babetên piştgiriya hiqûqî a Komelê pêwsitin, ji vê belê li gorî rewşê dem-wexta li cem xwe hilgirtina danayên, kêma an jî zêde dibe.

5) Ji bo parastina danayên we ê şexsî çi mafên we henin?

- a) Hûn bizanibin, em kîjan danayên we li cem xwe digrin û em wan bikartînin, ji ku hatinin, armanca bikaraninan vana, ji bo kê nin, û dîsa dem-wexta ku li cem xwe digrin (mafê gihîştinê).
- b) Hûn dikarin bixwazin daneyên xwe sererasbikin an jî lêzêde bikin, ji bo ku agahiyên we bitemamî û rastbin (mafê sererastkirinê). Di vê rewşê da ji bo pêdeviya sererastkirinê an jî lêzedekirinê pêwsîte hûn her carê belge-weraqe pêşkêşbikin
- c) Hûn dikarin bixwazin bo ku bikaranîna daneyên we ê şexsî werin sînordanîn (mafê sînordanînê).
- d) Ji bo her zêdetir bikaranîna danayên we ê şexsî ku em li cem xwe hildigrin redbikin/qebûlnekin (mafê redkirinê).
- e) Daneyên we ê şexsî ku em li cem xwe hildigrin bixwazin bila ji arşîvên me werin jêbirin (mafê jibîrkirinê).
- f) Bixwazin bila danayên we ê şexsî ku em li cem xwe digrin ji bo bikaranîna berpirsiyarî a tercîha we werin guhestin (mafê veguhestina daneyan).

Ji kerema xwe re têkildarî mafên we ên li jêr di bîra xweda bigrin:

- Tatmînkirina mafên we ên vebijêrkên (c), (d) û (e), eger daneyên we pêwsitbin ji bo van xizmetên piştgiriyê ku we daxwazkirine, mimkûne werin sekinandin.
 - Komel di her rewşê da mafê wê heye daxwaza we a ji bo sînordanîna bikaranînê, jêbirina danayên we ê şexsî red bike, eger vana ji bo bikaranînê an jî li cem xwe hildanê pêwsîte bo bikaranîn an jî bo piştgiriyê mafên ê qanûnî an jî bicîanîna mecbûriyetên qanûniyê wê.
 - Bi karanîna mafê veguhestinê (li jor di vebijêrka f) jêbirina danayên we ji arşîva Komelê ne minkûnê, ji ber ku di bin şertên paragrafa pêşinde ye.
 - Bi karanîna van mafên li jor ji bo dahatûyê-pêşerojê tînan bikaranîn, ne ji bo danayên ku heta vê gavê hatine bikaranîn.
- g) Hûn dikarin li Lijneya Parastina Danayên Şexsî (www.dpa.gr) gilî bikin, eger hûn bawerdikin ku mafê we bi awneyekî hatine binpêkirin.

6) Hûn çawa dikarin van mafên xwe ê li jor bikarbînin?

Ji bo ku hûn mafê xwe bikarbînin, forma ku karmendên Komelê dide we hûn dikarin vê forma niviskî tijebikin, îmze bikin û teslîmî karmendekî li pêjwaziyê bikin, an jî hûn dikarin bi rêya e-mailê bişînin navnîşana Komelê gdpr@solidaritynow.org

7) Em danayên we ê şexsî çawa diparêzin?

Komel danayên şexsî ê Sûdmendan li cem xwe hildigre û wan bi ewlahî bikartîne. Pergal-sîstem û pêvajoyên bikartîne veşartina karakterê danayên şexsî dabîndike, wek ku parastina wan ji wêrankirina wan a bêhemdî, wendabûna wan, guhertin, qedexebûna parvekirinê an jî gihîştin û her cûreyên bikaranîna bêmaf.

B. Razîbûn

Min ev agahiyên li jor xwendiyê û ji bo bikaranîna bi giştî danayên min ê şexsî û dîsa evên ku di bin kategoriya a yekê da ji bo bernameyên piştgiriya ku min hilbijartiyê ez razî dibim 1()

* Eger hûn razînebin ev dibe sedema nedayîna xizmetên ku we ji Komelê xwastin.

* Eger hûn razîbûna xwe bişûnda bikîşînin ev ji bo pêşerojê tê bikaranîn lê ne ji bo ên ku hatin bikaranîn, her gav dibe ku hûn razîbûna xwe bişûnda vekîşînin lê ev dibe sedema sekinandina dayîna xizmetên piştgiriya ji bo we.

Nav û paşnav

Îmze

Dem-tarîx